97

بەڕێوەبەرایەتی

زنجیرە کتێبی منداڵان

# Ezda

Nivîskar: AZAD KERÎMÎ

Wêne: şepol Mortazayî

97

بەڕێوەبەرایەتی

زنجیرە کتێبی منداڵان

# Zincîreçîrok
# 10 çîrokên kurt ên ji bo zarokan

Nivîskar: AZAD KERÎMÎ

Wêne: şepol   Mortazayî

# EZDA

وەزارەتی رۆشنبیری و لاوان
بەڕێوەبەرایەتی گشتی ڕۆژنامەنووسی و چاپ و بڵاو کردنەوە
بەڕێوەبەرایەتی
زنجیرە کتێبی منداڵان

خاوەنی ئیمتیاز: وەزیری ڕۆشنبیری و لاوان
سەرنووسەر: نیان ئەحمەد

زنجیرەی کتێب: ( ٩٧ )
ناوی کتێب: EZDA
نوسینی: ئازاد کەریمی
بەڕێوەبەری هونەری: شەمێران حەمید
نیگار: شەپۆل مورتەزایی
تایپ و هەڵە چن: نووسەر
سەرپەرشتیاری چاپ: عەبدولقادر عەلی مەردان
تیراژ: ( ٥٠٠ )
نرخی: ( ٥٠٠ ) دینار
لەبەڕێوەبەرایەتی گشتی کتێبخانە گشتییەکان ژمارەی سپاردنی ( ٢٧٥٥ ) ساڵی ( ٢٠١٠ )ی پێی دراوە

ناونیشان: شەست مەتری نزیك مزگەوتی حاجی موراد
ژمارەی تەلەفۆن: ( 0662647525 )
ئیمەیل: bzkm2010@yahoo.com

زنجیرە کتێبی منداڵان لەسەر ئەم سایتە بخوێنەوە www.kurdchap.com

# Pêşek

Armanca me ji nivîsandana vê zincîreçîrokên kurt a ji bo zarokan ew e ku zariyên kurd wêjeya xwe nas bikin. Meydana nasînê j,î bi qasî temenê wan dibe. Zarokên kurd divê hînî wêje û zimanê xwe bibin, nemaze hînî mehneyên wan peyvan bibin ku rojane wan bi kar tînin û her wisa divê ku zimansazî, wîşe, risteyên serekî yên sirûştî û destkiriya axaftina xelkê xwe û derdorên xwe nas bike.


Helbet, di vê zincîreçîrokê de ku li ber destê we ye, kesatiya sereke zarokên 6-7 salî ne û ew zarokên delal ku dema jiyana wan vedigere 9 -10 hezar sal berî niha, bi zarekî nerm xwendevanê biçûk a wê serdemê bi xwe re dibe cîhaneke tije azmûn û tecrûbe.

Ezda zarok e. Wargehê wî cihek li van deran e, lewre em dikarin rasterast bikevin nav sûjeya çîroka jiyana Ezda, heger 10 hezar sal jî bihurîbe.

Ezda dixwaze xwe û derdora xwe fehm bike, binirxîne. Armanca wî bi tenê naskirin û azmûngerî ye. Ew dixwaze bibêje ku min jî li koşeyek belkî jibîrkirî yê li vê dinyayê jiyame. Jiyan wîşeyek e ku bi hebûna mirov dikeve cîhana sûjeyê.


Navê wî kurikî Ezda ye. Temenê wî heşt sal e. Navê diya wî Jina û navê bavê wî jî, Jîre ye
Ezda, bi dayik, bav û kalikê xwe re dijî. Jiyana wan di nav zozanekî pir bidar û mêrg de derbas dibe. Mala wan di hundirê şikeftê de ye û malbata Ezda di nav wê şikeftê de jiyana xwe didomîne. Li pêşiya şikeftê dareke benîştekê ya mezin jî heye. Em ji wê darê re dibêjin Wen.






Ezda hemî spêdeyan ji xew radibe, diçe bin dara
Wenê, wê dihejîne û mêweya wê dikeve erdê.
Mêweya Wenê gir û wir e û hişk bûye. Navê wê
mêweyê Mazû ye. Bav çend caran bi Ezda sparişt
daye: Kurê min! Tu caran li dara Wenê ezyet neke.
Her dem Ezda ji xaniya xwe dûr dikeve, lê bi dîtina
bejna dara Wenê riya mala xwe dibîne. Dara Wenê, ji
Ezda re nîşana xanî, dê, bav û kal e.
Ezda, hez ji Wen, dê, bav û kalê xwe dike.

Rojekê Ezda ji kalê xwe pirs kir: Kalo.
Ew der ku der e? Kalê wî destê xwe da ser milê wî û got: Kurê min, ev der a me ye! Navê wî wargehî Şaxistan e.
Ezda dîsa pirsî: Şaxistan yanê çi?
Bapîr got: Ji cihê ku tijî çiya be dibêjin şaxistan. Şaxistan warê çiyayên bilind û sar e. Warê me di navbera du golan de ye.
Ezda zû pirs kir: Baş e kalo! Çima min qet ew du gol nedîtine?
Bapîr kenî û got: Weylo! Tu çi qas bilez î! Baş e ji te re bibêjim. Berî her tiştî gerek tu navê wan bizanî, piştre pêwîst e em şûna her du golan bizanibin.





Ezda dîsa pirs kir:Ê, baş e. Niha ji min re her tiştî bibêje.Kal bersiv da: Li milê rastê gola yekemîn e, ji wê re dibêjin Gola Şor. Ji ber ku tehma wê şor e û tije xwê ye. Gola din jî li aliyê çepê ye û navê wê jî Gola Tehl e. Sedema wê jî, tê de hebûna xwê û makên din ên tehl in

Gola Şor li rojhilatê şaxistana me ye û Gola Tehl jî li rojava ye. Gerek tu baş bizanib îroj ji rojhilat hildibe û li rojava jî diçe ava



Rojekê Ezda bi diya xwe re çû serê çiyê. Li wir her tişt hebû, wekî gul, giya û şînahî. Diya wî jê re got: Ezdacan! Ji vê rojê ve gerek e tu giya, şînahî û gulên derdorên xwe baş nas bikî û di dema munasîb de tu wan bi kar bînî. Divê tu baş li wan binêrî

Ezda pirs kir:Dayêcan! Çi kara bi zanîna van giyayan heye?

Diya Ezda bersiv da: Gelek ji wan giyayan wekî derman in û derd û nexweşînan baş dikin. Hindek jî dibin sedema nexweşînê. Ezda got:Çawa tiştên wisa dibe?

Dê got: Giyayên jehrî nexweşîn û mirinê tînin, ên saxlem û bêjehr jî, ji bo laş û bedena me bi kar tên
Ezda jê re got: Dayêcan! Heke giya şîn nebe çi dibe?
Dayik lê vegerand: Jiyan nameşe. Bi wî rengê ku genim, karî û xele ber hev nayên û em jî birçî dimînin. Ajalên wekî bizin û çêlek jî, ji ber ku alif .naxwin êdî ew jî şîr û goşt nadin me
Ezda got: Yanê şînahî dostên me ne. Nexwe ez ji wan jî hez dikim.



Şev hat. Yanê tav kete rojava û hewa tarî bû. Di vê demê de stêrkek li esman derket. Bavê wî got:  Ezdacan! Tu dizanî ew ronahiya biçûk çi ye?

Ezda bersiv da: Na, nizanim.

Bav got:  Ew stêrk e.

Ezda pirsî:  Çima stêrk ronî ne?

Bavê Ezda wiha got:  Ji ber ku stêrk ji xwe ronahî diweşînin.

Di wê demê de heyv derket. Heyv jî ronî bû. Bavê Ezda got dema ku tav diçe ava, heyv derdikeve ser rûyê esman.

Ezda pirsî:  Yanê tav temiriye?

Bav got:  Na na kurê min. Tav qet natemire, lê belê ew bi şev radize.

Ezda got:  Bavo, xewa te nayê?

Bav kenî û got:  Belê, xewa min tê. Xewa te jî tê?

Ezda westiyabû. Hêdî got  Erê.

Bav bi destê Ezda girt û bi hev re ji bo razanê çûn şikeftê.



Spêdeya rojekê, Ezda ji ber dengekî bilind ji xew rabû. Dema çavên xwe vekirin, dît ku wa kalê wî li kêleka w îrûniştî ye.
Ezda got:  Kalo, tu jî ji ber vî dengê ne rind rabûy?
Kalik got:  Erê kurê min. Xuya ye dîsan volkana Agirî rabûye.
Ezda pirs kir:  Volkana Agirî çi ye?
Kalik bersiv da:  Ka em derkevin û baş baş li çiyayê Agirî mêze bikin.
Ezda û bapîr derketin û li çiyayekî mezin ê ku li pêşiya wan bû mêze kirin ku bi ser xwe de agir û dû belav dikir her derê.
Berî ku Ezda tiştek bipirse Kalo wisa got:  Ew çiya, çiya Agirî ye. Yanê çiyayekî ku agir derdixe. Ji çiyayê ku agir û keldûmê derxe re, dibêjin volkan.
Ezda got:  Meriv dikare pêşiya wî agir û dûmanê bigire?
Kalik got:  Na, kes nikare. Zemanê berê, xelkê vê derê digotin ku li bin çiyayê Agirî ejdiyayek zîndankirî ye. Her wextê ku dilê wî bi hesret bikeve diaxîne. Axîna wî kel û dûman e.





Rojek ji rojên Xwedê dayik dibêje: Jîre! Berê xwe bide deşt û mêrgê  nêçîrekê bîne, goştê me yê xwarinê qut bûye.
Bav jî piştê hingê ku tîr, kevan, dav, tor û tevşo hilgirtin, got: Hadê kurê min, ez dixwazim te jî bibim nêçirê.
Ezda got: Ez nizanim nêçîr çi ye?
Kalê wî bersiv da: Kurê min, eger em herin çiya, deşt û zinaran û bi tor, dav û tîran kêrgoşk û xezalan bigirin bînin wê dayê ji goştê wan heywanan xwarinê çêbike. Ji vê re nêçîr tê gotin û ji me re jî nêçîrvan.
Ezda got: Qenciya nêçîrvaniyê çi ye?
Bav got: Qencî û karê wê ew e ku em birçî namînin û di zivistanê de nacemidin. Em postê xezal, hirç û rûviyan dikin cil û li xwe dikin. Rûnê laşê wan jî, ji bo ronahiya şikeftê em dikin şewata çirayê.
Ezda xwe amade kir ku bi bavê xwe re here nêçîrê.
Ezda niha nêçîrvan bû.

Şvek di nav şikeftê de dema ku hemî li dor agir kom bûbûn û rûniştibûn kalê Ezda der barê agir de ji malbatê re diaxvî, bapîr wisa digot:

Di demên bihurî de, zarokekî biçûk wekî Ezda digel bav, dê û kalê xwe dijiya. Şeveke sar, zarok û bavê wî li nêçîrê digeriyan. Baran şol şol dibarî. Ew şil bûbûn û lawik ji serma û seqemê dilerziya. Birûsk dihat û esman ronî dikir, dengê bilind radibû. Zarok tirsiyabû. Bavê kurikê biçûk got Netirse kurê min. Her cara ku ewr li hev bikevin ji wan birûsk çêdibe û piştre ew dengê dijwar tê guhê me.

Zarok êdî netirsiya, lê dîsa dileriziya. Bi carekê birûskek hat û li dareke mezin xist. Agir pê ket. Bavê lawik agir hilda û bire mala xwe. Malbata zarok bi germî û roniya agir, kêfxweş bûn.

Kalê Ezda wiha domand:

Niha piştî çend hezar salan em agir vedixin û bi wî awayî em xwe germ dikin








Hewa gelekî sar bû û berfê hemî der û dorê girtibnû.
Zevî di bin berf û seqemê de mabûn. Bayê herî sar dihat û mij û moran dinya girtibû. Malbata Ezda di şikeftê de dima.
Deriyê mixêrî bi post û çermê heywanên nêçîrkirî girtibûn.
Agir her dem vêxistî bû. Kalo bi qelema xwe li ser dîwarê şikeftê mijûlî wênekêşanê bû. Wî şeklê heywanan dikêşa:
Pezkovî, beran, gur û hesp.
Dayik jî xwarin çêdikir. Bav jî tevşoyê xwe tûj dikir. Kûrek di nav şikeftê de bû. Mencelek li ser bû, dikeliya.
Her dem Ezda li pêşiya agir radiwestiya, sîbera wî diket ser dîwêr. Ezda jî kêfxweş dibû û xwe dihejand. Sîbera wî jî dihejiya. Ezda bi lîstina xwe, malbata xwe dilgerm û şad dikir.
Bapîr wêne dikêşa û hêdî hêdî stran digot:

Jiyan bê şahî nameşe tu car
Tu zû be dayêcan, çêke girar
Pîstî zivistan bi xêr tê bihar



Êvara rojeke zivistanê bû. Rewşa hewayê hêdî û aram bû. Roj li esman bû û tav li erdê dixist. Ezda û diya xwe derketin deştê. Bi baweriya dê, germahiya tava zivistanê dibe sedema şabûna rihê mirov

Ezda, li bin dara Wenê rawestiyabû û bi berfan dilîst. Bi carekê erd hate hejandin û li şaxistanê dengekî bilind rabû. Ezda li çiyayê hemberî xwe mêze kir ku şexteyên mezin û giran ên berfa li ser wî diherkî û tê bi jêr de, dikeve deşt û newalan

Dayê got: Rundik hat!

Ezda weke her careke ku tiştek nû dibîne yan jî dibihîze, pirsyar kir: Rundik çi ye?

Diya wî bersiv dayê: Berf û şexteyên serê çiya dikevin ser hev û giraniya wan dibe sedema rundik. Rundik, tiştek îherî dijwar û talûke ye û her tiştê ku li pêşiya wî be, xera dike.

Hewa hêdî hêdî germ dibû. Berfa li şaxên dara Wenê jî nerm nerm diheliya û dilop bi dilop diket erdê. Kalê Ezda got:
Divê em xwe amadeyî cejna biharê bikin.
Ezda pirs kir: Sedema vê cejnê çi ye? Kengê ye, em ê çi bikin?
ema ku zivistan xelas dibe, çaxêD“ :Bapîr bersiv da Ezda biharê tê. Di wî çaxî de dar û şînahî ji xewa zivistanê radibin û dîsa şîn dibin ku fêkî ji me re çêkin. Heywan û ajal ji kunên xwe derdikevin der. Zirkêk jî çêkirina hingiv dest pê dike. Em jî, ji bona hatina biharê, beşdarî wan nîmetan dibin, lewma bi pêrgiya bihar re em diçin şahî ûcejnê dikin. Em spasiya Xwedayê xwe dikin ku ev şaxistan diyarî me kiriye. Xuya ye ku Xweda ji me hez dike. Em jî hejî wî dikin.
Bicihanîna merasîma cejna biharê yanê hezkirina jiyanê.



چاپخانەی ڕۆشنبیری - هەولێر